# Rêberek ji bo dibistanên lîseya bilind yên bijarte û dersên derfetê

Dibistanên lîseya bilind yên bijartî û dersên derfetê eyarên dibistana pispor in ku bi hev re **xwendekarên xwedî şiyanên bilind û jêhatî** kom dikin.

Hînbûna bi hevalên polê re yên xwedî heman karîn, alîkariya pêşketin û tenduristiya akademîk ya xwendekaran dike.

Xwendekar hîn jî mihaca NSW dişopînin, lê belê mamoste dikarin ji bo xwendekarên xwedî şiyanên bilind û jêhatî stratejiyên hînkirinê yên taybet bi kar bînin.

## Dibistanên lîseyên bilind yên bijarte

4 cureyên dibistanêlîseyên bilind ya bijarte hene:

- **dibistanên lîseya bilind yên bi tevahî bijartî** - ev dibistanên ku hemî xwendekar li ser bingeha ezmûna bicihkirinê hatine hilbijartin
- **dibistanên lîseya bilind yên bi parçeyî bijarte ne**- ev dibistanên ku komek ji xwendekarên bijartî û xwendekarên herêmî hene
- **dibistanên lîseya bilind yên çandiniyê**- ev dibistanên ku balê dikişîne ser xwendina çandinîyê û hemû xwendekar li ser qabilîyeta xwe ya akademîk hatine hilbijartin. Hin ji van dibistanan jî panêlê peyda dikin ku xwendekar li dibistanê dijîn
- **Aurora College** - ev dersên bijarte yên onlayn in. Ew li lîseyên giştî yên herêmî yên li gundewar û deverên dûr tên dayîn.

## Dersên derfetê

Dersên derfetê ji bo xwendekarên xwedî şiyanên bilind û jêhatî ne di polên 5 û 6 ne. Li gelek dibistanên seretayî yên giştî yên li NSW dihên pêşnîyarkirin.

Aurora College li dibistanên xwe yên seretayî yên herêmî ji bo xwendekarên gundî û dûr dersên derfetê yên onlayn dide.

## Ew li ku derê ne?

Dibistanên lîseya bilin yên bijarte û dersên derfetê li seranserê mêtropol, herêmî û gundewarî yên NSW hene. Ji bo dibistaneke nêzî we li nexşeyên li jêr binêre.

- Derseke derfetê bibîne
- Dibistaneke bijarte bibîne

 CC BY 

## Ez dê çawa bizanim ku ji bo zarokê min guncaw e yan na?

Gelo zarokê te:

- kêfa xwe ji xwindinê re tê
- meraqeka xwe ya giran heye
- bîreke baş nîşan dan
- pirsên zehmet dipirise
- dema ku tiştên nû fêr dibe, kêmtir dubare hewce dikin
- awayên afirîner ên ramanê nîşan dide
- li qada wî/wê a eleqedar an jî dilkêşiyê bi giranî bal darizîne?

Heger hin ji van mîna zarokê te be, dibe ku dersa fersendê an jî dibistana lîseya bilind ya bijarte dibe baş be.

## Ez çawa dikarim bisepînim?

Dê û bav di dema serlêdanê de li ser înternetê serlêdanê dikin: shsoc.education.nsw.gov.au

## 2026 ketina nav derseke derfetê an dibistana lîseya bilind ya bijarte

Dema serlêdanê ya ji bo ketina 2026 ji **7'ê Mijdara 2024** heta **21'ê Sibata 2025 e.**

### Dema ez serlêdanê dikim, dive zarokê min di kîjan polê de be?

**Dersên derfetê**

Dê û bav dema ku zarokê wan nêzî dawiya pola 3yê ya 2024 an jî di destpêka pola 4 a 2025an de serlêdanê dikin.

**Dibistanên lîseya bilina yên bijarte**

Dema zarokê wan nêzî dawiya pola 5 a 2024 an jî di destpêka pola 6 a 2025 de dê û bav serlêdanê dikin.

Li ser malpera me der barê pêvajoya serlêdanê û pêdiviyên rûniştinê yên li ser kî dikarin serî li dersên derfetê bidin û kî dikarin ji bo lîseyên bijarte serlêdanê bikin de zêdetir agahî bigirin.

## Ezmûna bicihkirinê

Piştî ku we serlêdan kir, divê zarokê we ezmûnekê bike. Xwendekar piştre li gorî performansa xwe ya ezmûnê ji bo bicihkirinê tên hilbijartin.

### Ezmûn kengî ye?

Ezmûn dê ji **2'ê Gulanê ji înê 2'ê Gulanê heta yekşemê 4'ê Gulana 2025** di dirêjahîya 3 rojan de amade be.

Xwendekar tenê beşdarî rojeke ezmûnê dibin û ji bo ku ezmûna bicihkirinê hewce **nake** komputera xwe bînin.

## Di ezmûnê de çi heye?

Di ezmûnê de tête nirxandin ku xwendekar çi dixwînin, sedema bikaranîna matematîk û hunerên ramana wan fêm dikin. Serlêdanên ji bo dibistanên lîseya bilind ya bijarte jî li ser hunerên xwe yên nivîsandinê tên ezmûn kirin.

Zêdetir hîn bibe li ser Placement test.

# Ez dê kengî encamên zarokê xwe hîn bibim?

Piştî ku zarokê we ezmûnê bike, hun dê bi encama ezmûnê û gavên din di Term 3 de îmêlekê bistînin. Eger cihek ji zarokê we re bê pêşkêşkirin, hun ê der barê çawaniya tomerîkirinê de agahiyan bistînin.

# Modêla Dadperweriya Bicihkirina

Modêla Dadperweriya Bicihkirina Kapîtaljiyê, ji bo hemû xwendekar bi hêsanî xwe bigihînin dibistanên bilind û dersên derfetê yên bijarte, dibe alîkar.

Di bin Modelê de, ji sedî 20 xwendekarên li her dibistana bilind û derfetê ji bo xwendekarên bilind û jêhatî têne girtin:

- ji qadên kêm-civakî-perwerdehî
- yên ji paşxaneya Aborjînal û / an Girava Torres Strait
- Ji cihên gundî û dûr
- bi astengiyê.

Cihên ku tên girtin, li ser bingeha encama wan a di testa bicihkirinê de pêşkêşî xwendekaran tê kirin.

Zêdetir tiştan hîn bibin li Fair Access.

**Piştgiriya xwendekarên diyarkirî li hemû dibistanên giştî yên NSW**

Dersên amadeyî yên bijarte û dersên derfetê tenê yek ji wan awayan e ku Beşa Perwerdeyê ya NSW piştgirîya xwendekarên xwedî şiyannê bilind û jêhatî dike.

Xwendekarên xwedî şiyanên bilind û jêhatî, ji bo bigihîjin hemû dibistanên giştî yên NSW dihên piştgirîkirin. Der bare siyaseta xwendinkirina yê xwedî şiyanên bilind û jêhatî ya wezareta Perwerdehê de zêdetir agahîyan bigirin.

CC BY

# Pêdiviya we bi agahiyên zêdetir heye?

Ji bo agahîyên berfirehtir li ser malperên jêr kontrol bikin.

## Rûpelên webê ji bo dêûbav û kargeran

- **Dersên amadeyî yên bijarte û derfet:** education.nsw.gov.au/shs-oc
- **Dibistanên lîseya bilind yên bijarte:** education.nsw.gov.au/shs-yr7
- **Dersên derfetê:** education.nsw.gov.au/oc

## Rûpelên webê ji bo xwendekaran

- **Lîseya bilind ya bijarte û dersên derfetê ji bo xwendekaran:** edu.nsw.link/shs-oc-students
- **Serlêdana ji bo çîna derfetê:** Huba çavkaniyên xwendekaran: edu.nsw.link/OChub
- **Ji bo serlêdana dibistaneka lîseya bijarte:** Huba çavkanîya xwendekaran: edu.nsw.link/SHShub

## Medyaya civakî

Beşdarî komên me yên fermî yên Facebookê bibin:

- **Cihê dibistana amadeyî ya bijarte:** edu.nsw.link/shs-fb
- **Dersên derfetê:** edu.nsw.link/oc-fb

## Bi me re têkiliyê deynin

Bi Yekîneya Perwerdeyê ya Bijarte (Selective Education Unit) re têkilî daynin:

**Îmêl:** ssu@det.nsw.edu.au

**Telîfon:** 1300 880 367

**Xizmeta wergerandinê: 131 450**

Heger hewcehîya we bi wergêrekî hebe ku alîkarîya lêpirsîna we bike, ji kerema xwe li xizmeta wergêrên li ser telîfonê bigerin û ji operatorê re bibêjin:

- zimanê ku tu dixwazî
- numreya telîfonê ya ku tu dixwazî lê bigerî.

Operator dê li numreya telîfonê ya Yekîneya Perwerdehiya Bijarte (1300 880 367) bigere û ji bo alîkarîya we ya ji bo axaftina we wergêrekî li ser xetê bistîne. Ev xizmet blaş e.